

# Kako 'ebdî Ne'san , mêrxas u lehengê kurdan

**peyvek vekirî ji midyaê rûdaw re**

wekî ku j dastan u efsanan re tê , xwrtêk delal de rojîn tarî u teng , çetîn , şewezeng u tijî bahozê hoz u gel , ji kurdistana zincîrkirî ji dayk debe , de kor u amîza lehengên xaraw u çarjawên bahozê dagîrkarî mezin debe , bi şîrî kurdênî u nîştiman perweî u wilat parîzî , tê firçik dan , ala rengîn re rademûsê , peymana xwe serdestê Xanî u Çezîrî u Xana u Hacî , bi xak u xelkên kurdistan re deda ku ser rêçka mezinan u başpehlewanan , evîndarê xwe , kurd u kurdistan , nexasma karker u cûtkar u pale u rencberan , biparêzê , parast jî . kako 'ebdî a me , ji wan babetên mêrxas u 'egîdên degmen u nemaze bû ku jyan u cana xwe deken desmaye ji bo armanca xwe ên pîroz u mirovane . paporê şepolşikênê rizgarya kurd u kurdstan ji deryayê tofanya dagîrkary rêketibu , apê

# کاکۆ عەبدی نەعسان ، مێرخاس و لەهەنگێ کوردان

**پەیڤەک ڤەکری ژ میدیاێ روداو رە**

وەکی کو ژ داستان و ئەفسانان رە تێ ، خورتێک دەلال دە ڕۆژین تاری و تەنگ ، چەتین ، شەوەزەنگ و تژی باهۆزێ هۆز و گەل ، ژ کوردستانا زنجیرکری ژ دایک دەبە ؛ دە کۆر و ئامیزا لەهەنگێن خاراو و چارژاوێن باهۆزێ داگیرکاری مەزن دەبە ؛ بە شیری کوردێنی و نیشتمان پەروەی و ولات پاریزی ، تێ فرچک دان ؛ ئالا ڕەنگین رە رادەمووسێ ؛ پەیمانا خوە سەردەستێ خانی و جەزیری و خانا و حاجی ، بە خاک و خەلکێن کوردستان رە دەدا کو سەر ڕیچکا مەزنان و باش پەهلەوانان ، ئەڤینداری خوە ، کورد و کوردستان ، نەخاسما کارکەر و جووتکار و پالە و ڕەنجبەران ، بپارێزێ ، پاراست ژی . کاکو عەبدی ئا مە ، ژ وان بابەتێن مێرخاس و عەگیدێن دەگمەن و نەمازە بوو کو ژیان و جانا خوە دەکەن دەسمایە ژ بۆ ئارمانجا خوە ێن پیرۆز و مرۆڤانە . پاپۆرێ شەپۆل شکینێ ڕزگاریا کورد و کوردستان ژ دەریایێ تۆفانیا داگیرکاری رێکەتبوو ، ئاپێ عوسمان سەبری و نورەدین زازا فەرمانداری پاپۆر و عەبدی ژی خەباتکاری چەلەنگ و نەبەز ێن پاپۆر .

Osman Sebry u Nuredyn Zaza fermandarê papor u 'ebdî jî xebatkarê çeleng u nebez ên papor .

camêr u xweş mêrê me , keke ‘ebdo , helweda u 'ewdalê rizgarîa evîna xwe , kurdistan , ji rê u rêçka rizgariya evîna xwe a êxsîrkirî degeriya , cîhana serdem , rêçka çepayetî ji wî re vekir . ‘ebdo vê rêçke girt ji bo kurdan u vê rêçke kurdand . Heval ‘ebdo buye hêmaêd çepê kurdan be taybetmendiya a taybeta xwe , heval u hogirên rasteqîne ên pale u rencderan u bi wan re bû êk . ‘ebdî , Aramî başûr bû , ‘ebdî hemehiseyn u fwad ên rojhelat bû . ‘ebdî 'egîdê bakûr bû . zêdeê wan jî , kako ‘ebdo evîn u evîndara xwe xweş nas dekir , dîrok u mêjû , ziman , çand u ferhenga kurdî dekir dyarya destên xwe ji bo evîn u evîndarya xwe . Ew bar u erkên Çeladet Bedrxan xist estoêd xwe u mala xwe kir fêrgeha fêrkariya ziman u çand u dîroka kurdî . Gava ku hegbeêd wî a zanist u zanyarî têra dilê wî kir , malek ji karkeran re ava kir, " partiya karkerên kurd " ji sûriye .

جامێر و خوەش مێرێ مە ، کەکە عەبدۆ ، هەڵوەدا و عەوداڵێ ڕزگاری ئەڤینا دەلالا خوە ، کوردستان ، ژ ڕێ و ڕێچکا ڕزگاریا ئەڤینا خوە ئا ئێخسیرکری دەگەریا ، جیهانا سەردەم ، ڕێچکا چەپایەتی ژ وی رە ڤەکر . عەبدۆ ڤێ ڕێچکە گرت ژ بۆ کوردان و ڤێ ڕێچکە کورداند . هەڤال عەبدۆ بوویە هێمایێد چەپێ کوردان بە تایبەتمەندیا ئا تایبەتا خوە ، هەڤال و هۆگرێن ڕاستەقینە ێن پالە و ڕەنجدەران و بە وان رە بوو ئێک . عەبدی ، ئارامی باشوور بوو ؛ عەبدی ، حەمەحسەین و فوئاد ێن ڕۆژهەلات بوو ؛ عەبدی ، عەگیدێ باکوور بوو . زیدەێ وان ژی ، کاکۆ عەبدۆ ئەڤین و ئەڤیندارا خو خوەش ناس دەکر ، دیرۆک و مێژوو ، زمان ، چاند و فەرهەنگا کوردی دەکر دیاریا دەستێن خوە ژ بۆ ئەڤین و ئەڤینداریا خوە . ئەو بار و ئەرکێن جەلادەت بەدرخان خست ئەستۆێد خوە و مالا خوە کر فێرگەها فێرکاریا زمان و چاند و دیرۆکا کوردی. گاڤا کو هەگبەێد وی ئا زانست و زانیاری تێرا دلێ وی کر ، مالەک ژ کارکەران رە ئاڤا کر ، " پارتیا کارکەرێن کورد " ژ سووریە .

'bido , Hacî Qadir asa , ji Stambolê hizra kurdistanî bûna xwe behêz kir , debê ku ba fêrgeha Apê Musa Anter . Mala Haco aga çava bû , hana jî , deriya mala ‘ebdo a kesayetî u ên siyasî u civakî ji kurdan re gişt wala bû u her kes têda cîhê xwe degirt . Bakûryan rastî tengejeên xebat re hatin u de mala ‘ebdo girsaneve u ‘ebdo be wan re bû êk . Partî ên karkerên kurd u kurdistan î de bakûr u î de rojava bûn mîwanê hevudû . Lê mîwanên ‘ebdo be dwjmnên wî , dêwezimey be's , le hev hatin . Birayetî u mêwandarî u hawhawî winda bû . Rê ji hevûdû veqetiya . Zam u birîna kûr ên weyşûmey zinnarî (hizam) 'arebî u mihemed teleb helal u regezperestên dinê a 'arebên hawpêrê wî , hêj xûn deçorand u cana kurdan azar deda . ‘ebdo ser rêçka kurdênî a xwe resen u serdemyane ma u tev bûn be be'sî esedî re wekî tawan didît , hem ji dijî kurdan u hem jî ji dijî bîr u hizra çepayetî . ‘ebdo pir xweş u pir bi zanabûn ew çend xuya kir ku ew têkelî bi be's re debit hokar ji bo malwêraniya

عبدۆ ، حاجی قادر ئاسا ، ژ ستامبۆلێ هزرا کوردستانی بوونا خوە بە هێز کر ، دەبێ کو با فێرگەها ئاپێ موسا ئەنتەر . مالا حاجۆ ئاغا چاڤا بوو ، هانا ژی، دەریا ماڵا عەبدۆ ئا کەسایەتی و ێن سیاسی و جڤاکی ژ کوردان رە گشت والا بوو و هەر کەس تێدا جیهێ خوە دەگرت . باکووریان ڕاستی تەنگەژەێن خەبات رە هاتن و دە مالا عەبدۆ گرسانەوە و عەبدۆ بە وان رە بوو ئێک . پارتی ێن کارکەرێن کورد و کوردستان ئی دە باکوور و ئی دە ڕۆژئاڤا بوون میوانێ هەڤودوو . لێ میوانێن عەبدۆ بە دوژمنێن وی ، دێوەزمەی بەعس ، لە هەڤ هاتن . برایەتی و مێوانداری و هاوهاوی وندا بوو . ڕێ ژ هەڤوودوو ڤەقەتیا . زام و برینا کوور ین وەیشوومەی زنناری (حزام ) عارەبی و محەمەد تەلەب هەلال و ڕەگەزپەرەستێن دنێ ئا عارەبێن هاوپێرێ وی ، هێژ خوون دەچۆڕاند و جانا کوردان ئازار دەدا. عەبدۆ سەر ڕێچکا کوردێنی ئا خوە ڕەسەن و سەردەمیانە ما و تەڤ بوون بە بەعسی ئەسەدی رە وەکی تاوان دەدیت ، هەم ژ دژی کوردان و هەم ژی ژ دژی بیر و هزرا چەپایەتی . عەبدۆ پڕ خوەش و پڕ بە زانا بوون ئەو چەند خویا کر کو ئەو تێکەلی بە بەعس رە دەبێت هۆکار ژ بۆ مال وێرانیا کوردان و کارەسات ژ ڕۆژئاڤا . ما

kurdan u karesat ji rojava . Ma îro emê nemakarîn bi çavên xwe ew karesat bibînîn ku hizra ‘ebdo pêşbînî dekir .

ئیرۆ ئەمێ نەماکارین ب چاڤێن خوە ئەو کارەسات ببینین کو هزرا عەبدۆ پێشبینی دەکر .

kako ê me , kako ‘ebdo cana xwe ser rêbaza kurdênî ên xwe a serdemyane bext kir u hat têror kirin . Şîwaz jî , şêwazê qirêj u nigirîsê be'sî , ku pişt re jî cana Meş'el Temo u Şêx Me'şûq kir qwrbaniya xwe .

کاکۆێ مە ، کاکۆ عەبدۆ جانا خوە سەر ڕیبازا کوردێنی ێن خوە ئا سەردەمیانە بەخت کر و هات تێرور کرن . شیواز ژی ، شێوازێ قرێژ و نگریسێ بەعسی ، کو پشت رە ژی جانا مەشعەل تەمۆ و شێخ مەعشووق کر قوربانیا خوە .

kesayetiya şorşgêrî a ‘ebdî Ne'san , hêmaêt herî dyar u zeq a serdemek j mêjû u dîroka kurdewarî ye u şiyaw u şayany rêz u sipasî kurdane ye u kurd jî gereke ku pir xweş pê bizanin u pêzanîna xwe ji mêrxas u lehengê xwe , ‘ebdo , re pêşkeş biken , emê dê bikeyn , her u her .

کەسایەتیا شۆڕشگێری ئا عەبدی نەعسان ، هێمایێت هەری دیار و زەق ئا سەردەمەک ژ مێژوو و دیرۆکا کوردەواری یە و شیاو و شایانی ڕێز و سپاسی کوردانەیە و کورد ژی گەرەکە کو پڕ خوەش پێ بزانن و پێزانینا خوە ژ مێرخاس و لەهەنگێ خوە ، عەبدۆ ، رە پێشکەش بکەن ، ئەمێ دێ بکەین ، هەر و هەر .

Lê , mixabin , de roja bîranîna yad u bîreweriya vê başpehlewanê kurdan , Rûda ev kesayetiya siyasî u şorşger wekî xêrxwazek dida naskirn ku ji dermanxane ya xwe bi bê pare derman dida feqîr u hejar u belengazan . Rûdaw bi tu ava amaje be xebat u têkoşîna siyasî u şorşgêrî u kurdênî a karîger u erênî ên kako ‘ebdo naket u debêjê ku de ber dermanxana xwe hat kuştin u şehîd bû . Çêroka ku Rûdaw ser ‘ebdo bilav deka , ne çêrokê kakoêd meye be temamî . Di vê çîroka Rûdaw de , emê kakoêd xwe şorşger , kurdperwer u kurdparêz , mîna hêmayek ji bo serdema xwe , winda dikeyn . Be's u bingeha siyaseta mirov kwjî u kurd kwjîa be'sî jî xuya nabin . Karesat u alozî ên doxa siyasî u civakî a henûkeyî ên rojava ku ‘ebdo pêşbînî dekir , bi jyan u xebat u têror kirna lehengê me , kako ‘ebdo re hatiye girêdan . Bi nasîna kesayetî ên mîna ‘ebdo u î dinê wekî wî ku ji rojava pirin , emê dikarîn berçava xwe rûn bikeyn u ew çend pir bibaşî têbigehîn ka çava ew dox kete holê .

لێ ، مخابن ، دە ڕۆژا بیرئانینا یاد و بیرەوەریا ڤێ باش پەهلەوانێ کوردان ، ڕوودا ئەڤ کەسایەتیا سیاسی و شۆڕشگەر وەکی خێرخوازەک ئانکو تاکەکەسەک دەدا ناس کرن کو ژ دەرمانخانەیا خوە بە بێ پارە دەرمان دەدا فەقیر و هەژار و بەلەنگازان . ڕووداو بە تو ئاڤا ئاماژە بە خەبات و تێکۆشینا سیاسی و شۆڕشگێری و کوردێنی ئا کاریگەر و ئەرێنی ێن کاکۆ عەبدۆ ناکەت و دەبێژێ کو دە بەر دەرمانخانا خوە هات کوشتن و شەهید بوو . چێرۆکا کو ڕووداو سەر عەبدۆ بڵاڤ دەکا ، نە چێرۆکێ کاکۆێد مەیە بە تەمامی . دە ڤێ چیرۆکا ڕووداو دە ، ئەمێ کاکۆێد خوە شۆڕشگەر ، کوردپەروەر و کوردپارێز ، مینا هێمایەک ژ بۆ سەردەما خوە ، وندا دەکەین . بەعس و بنگەها سیاسەتا مرۆڤ کوژی و کورد کوژیا بەعسی ژی خویا نابن . کارەسات و ئالۆزی ێن دۆخا سیاسی و جڤاکی ئا هەنووکەیی ێن ڕۆژئاڤا کو عەبدۆ پێشبینی دەکر ، بە ژیان و خەبات و تێرور کرنا لەهەنگێ مە ، کاکۆ عەبدۆ رە هاتیە گرێدان . بە ناسینا کەسایەتی ێن مینا عەبدۆ و ئی دنێ وەکی وی کو ژ ڕۆژئاڤا پڕن ، ئەمێ دکارین بەرچاڤا خوە ڕوون بکەین و ئەو چەند پڕ بەباشی تێ بگەهین کا چاڤا ئەو دۆخ کەتە هۆلێ .

Rudaw amaje bi alykarya ‘ebdî Ne'san bi pkk u nexasma Ocalan re dika , lê xuya nakey ku çima ‘ebdî , ne mîna takekes , lê belê wekî endamê kara u çalakê sazy ên syasy a Rojava , ev alykarî dekir . Bîr u hizrên wî u sazya wî çi bu u ser çi rêbazek demeşî . Fire fire

ڕوودا ئاماژە بە ئالیکاریا عەبدی نەعسان بە پ ک ک و نەخاسما ئوجالان رە دکا ، لێ خویا ناکەت کو چما عەبدی ، نە مینا تاکەکەس ، لێ بەلێ وەکی ئەندامێ کارا و چالاکێ سازی ێن سیاسی ئا ڕۆژئاڤا ، ئەڤ ئالیکاری دەکر . بیر و هزرێ وی و سازیا وی چ بوو و سەر چ ڕێبازەک دەمەشی . فرە فرە

balkêşterter jî ew çende ku kurdan bizanbin ka çawa ew alykary veqetya u bingeha hizry u syasya ev veqetandin çi bu. Weky me amaje pêre kir , tevbuna pkk bi be'sê dagîrker u dwjminê kurdan , tawanek dîroky bu , gor hizr u ramana ‘ebdî . Akam u berhemêd ew hawpeymanya ne pîroz nawbera be's u pkk , ew doxa qeyranawî ên Rojava di dema îro de , çê kirye ku sukayety kirin bi ala kurdan u Ey Reqîb u Pêşmerge u gist hêmaêd neteweî a kurdan buyte akar u nîşana wan kesan ku ‘ebdî Ne'san berê deyan salan xwe ji wan veqetand . Lewra , qala alykarya ‘ebdî bi pkk u ocalan betenê wlo dida xuya kirin ku ‘ebdo jî ser rêbaza apoçîyetî demeşî . Debê ku şehyd kirina ‘ebdî ji alyê be's , syasetek be'sî bubêt ku partya karkerên kurd ji surye u endamê herî çîalakê vê sazy tune bikat u rê ji partya karkerên bakur (pkk) re xweş bikat daku kurd u doza kurdî ji bo berjewendya xwe bikar bîne .

‘ebdî Ne'san kesayetîek herî dyar bu ku ji hembera rêçka apoçîety ji rojava derket u her fre zu xwe ji wan veqetand . Bin çav u kor kirina vê rastî u betenê amaje kirin bi alykarya wî bi pkk u ocalan ji alîê Rudaw . çewaşekaryek nebaş , bi zana bun anku nezanî , ji dîrok u serbehurya syasy u civakya kurdan ji Rojavaye .

بالکێشتەرتەر ژی ئەو چەندە کو کوردان بزانبن کا چاوا ئەو ئالیکاری ڤەقەتیا و بنگەها هزری و سیاسیا ئەو ڤەوقەتاندن چ بوو . وەکی مە ئاماژە پێرا کر ، تەڤبوونیا پ ک ک بە بەعسێ داگیرکەر و دوژمنێ کوردان ، تاوانەک دیرۆکی بوو ، گۆر هزر و ڕامانا عەبدی . ئاکام و بەرهەمێد ئەو هاوپەیمانیا نە پیرۆز ناوبەرا بەعس و پ ک ک ، ئەو دۆخا قەیراناوی ێن ڕۆژئاڤا د دەما ئیرۆ دە ، چێ کریە کو سووکایەتی کرن ب ئالا کوردان و ئەی ڕەقیب و پێشمەرگە و گشت هێمایێد نەتەوەییا کوردان بوویتە ئاکار و نیشانا وان کەسان کو عەبدی نەعسان بەرێ دەیان سالان خوە ژ وان رە ڤەقەتاند . لەورا ، قالا ئالیکاریا عەبدۆ بە پ ک ک و ئوجالان بەتەنێ ولۆ دەدا خویا کرن کو عەبدۆ ژی سەر ڕیبازا ئاپۆچیەتی دەمەشی . دەبێ کو شەهید کرنا عەبدۆ ژ ئالیێ بەعس ، سیاسەتەک ئا بەعسی بووبت کو پارتیا کارکەرین کورد ژ سووریە و ئەندامێ هەری چالاکێ ڤێ سازی تونێ بکات و ڕێ ژ پارتیا کارکەرێن باکوور ( پ ک ک ) رە خوەش بکات داکو کورد و دۆزا کوردی ژ بۆ بەرژەوەندیا خوە بکار بینە .

عەبدی نەعسان کەسایەتیەک هەری دیار بوو کو ژ هەمبەرا ڕێچکا ئاپۆچیەتی ژ ڕۆژئاوا دەرکەت و هەر فرە زوو خوە ژ وان ڤەقەتاند . بن چاڤ و کۆر کرنا ڤێ ڕاستی و بەتەنێ ئاماژە کرن بە ئالیکاریا وی بە پ ک ک و ئوجالان ژ ئالیێ ڕووداو ، چەواشەکاریەک نەباش، بە زانا بوون ئانکو نەزانی ، ژ دیرۆک و سەربهووریا سیاسی و جڤاکیا کوردان ژ ڕۆژئاڤایە .

kardox
komeley yeksanî kurdistan
20/5/2016

کاردۆخ
کۆمەڵەی یەکسانیی کوردستان
٢٠١٦/٥/٢٠